Hackney Homes News
Çileyê Pêşîn 2007

Şagirtîya Hackney Homes rê li ber di karên avahîyan de xebata jinan vedike

Xeratî (necarî). Borîsazî. Elektrîk. Ev tenê hinek pîşe ne ku wek beşeke projeya Şagirtîyê ya Hackney Homes ji bo ciwanên 16-19 salî peyde dibin. Ji bo vê, balkişandina ciwanan dikane carinan karekî dijwar be.

Rûniştîyeke Hackney ji xwe re kiriye mîsyon ku karên avahîyan ji bo ciwanan, bi taybetî jinên ciwan ên ku li navçeyê rûdinin, balkêş bike.

Callie Duncan'a ku vî çendî xelata Hevkarîya Mikemelîya Xizmeta Gelêrî ya Salê (APSE) sitendiye li dijî ramana ku karên avahîyan 'ji bo mêran' e radiweste û vê mesajê derbasî jinên ciwan ên din li Hackney dike.

"Beşeke vê karî ku herî pir ez hez dikim ew e ku ez bi jinên ciwan ji gelek piştgehên cuda ku hîn jî li ser pîşeyê xwe yê pêşedemê difikirin re dipeyivim.

Ev gelekî teşwîkkar e, ji ber ku ez dikanim pirsên wan bersîv bikim û heke mîtên (bawerîyên batil) wan ên li ser xeratîyê hebin, ji hev bixim".

Ev xebat, li gel karê wê yê rojane wek Ambasadorê Trusta Avakarîyê ya Ciwanan dibe alîkar ku bêtir jin ji bo karên avahîyan bên teşwîkkirin. Di vê rolê de, ew diçe xwendegehên herêmê ku jinên ciwan bibîne û li ser tecrubeyên xwe û kêrhatin û xelatên xebata karên avahîyan bi wan re bipeyive.

Callie, wek xerata şagirt dest bi karê xwe kir û piştî qedandina perwerda xwe, ew mezûn bû ku bibe karmenda gişt-dem a Hackney Homes.
Susmita Noonana ku Serok Birêvebira Demî ya Hackney Homes e wisa got: “Ji bo Callie serketineke mezin e ku bûye şagirta jin a salê. Dilsozîya wê ya ji bo karê wê û dema ku ji bo alîkarîya jinên din ên ciwan vediqetîne, baş tê naskirin. Ew bi tecrubeya xwe raber dike ku pîşeyek dikane çiqas bi xelat be”.

Serîlêdanên ji bo şagirtîyên nuh dê di nîvê 2008an de dest pê bikin. Agahîya li ser sîstema serîlêdanê dê bi rêya websîteya Hackney Homes peyde bibe: www.hackneyhomes.org.uk

Kurtîya Nûçeyan

Di dema Noelê de seetên vekirî

Roja Noelê (25ê Çileyê Pêşîn), Roja Paş Noelê (Boxing Day 26ê Çileyê Pêşîn) û Roja Serê Salê (1ê Çileyê Paşîn): hemû Ofîsên Taxê û Ofîsa Navendî yê girtî bin.

Ji xêndî rojên li jor gotî, Ofîsên Taxan ê wek her tim (9.00 – 17.00) xebatê bikin. Ji kerema xwe bi bîr bînin ku ji ber dema betlanê hinek xizmet ê bi kêmasî xebatê bikin.

Navenda Têkilîyan a Tamîran ê Roja Noelê, Piştî Noelê û Serê salê 24 seetan vekirî be, tenê ji bo xizmetên tamîrên acil. Heke we rewşeke acil hebe, ji kerema xwe telefon bikin bo 020 8356 3691.

Ji bo Hackney Homes demên vekirî ji xêndî rojên jêrîn ên di dema Noelê de têrmijûl, wek her tim in.

Hema şîfreyê bipirsin

Heke li ser ewlekarîya we fikarên we hebin an jî fikaran dikin ku kesekî xapînok tê mala we, wê gavê dema ku carek din pêwîstîya we çêbibe ku karkerekî Hackney Homes were mala we tamîran bike, hun dikanin şîfreyê bipirsin.

Pir hêsan e. Dema ku hun telefonî Navenda Têkilîyê ya Tamîran li 020 8356 3691 dikin, hema ji endamekî tîma me şîfreyekê bixwazin. Ev dikane her tiştekî ku we hilbijartîye be – navê heywanê we yê malê, navê dayika we yê qîztîyê, cîhê bûyina we – her tiştekî ku hun kanibin bînin bîra xwe.

Dema ku karkerên tamîran bên mala we ku tamîrê biqedînin, ew ê ji we re şîfreyê jî bibêjin. Bê guman ew ê her weha unîforma Hackney Homes jî li xwe bikin û nasnameya bi fotograf bi xwe re bigerînin ku dilê we têxin cîh ku ew ji Hackney Homes tên.

Ji bo bêtir agahîyê, bidestxistina bêtir agahîyan li ser tamîran, ji kerema xwe telefon bikin bo 020 8356 3691.

Li ser vê hejmara Nûçenameya Hackney Homes qet şîroveyên we hene? Qet nûçe an ramanên çîrokan hene ku ji me re bibêjin? Ji kerema xwe bi tîma Komunîkasyonê ya Hackney Homes re têkilî çêbikin, 020 8356 3528 an jî email: HousingEditor@hackneyhomes.org.uk

Serketîyên pêşbazîya teserûfa enerjîyê

Pîrozbahî ji bo nişstecîhên bi siûd ên jêrîn ku di pêşbazîya Teserûfa Enerjîyê ya Hackney Homes de Standby Busters bidest xistine (wek ku di hejmara Cotmehê ya Nûçenameya Hackney Homes de hatiye raberkirin).

Sheila Suso-Runge – Homerton
Evelyn Wright – North East Neighbourhood
Anna Jones – Queensbridge û De Beauvoir
Lyndsay Hilliam – Shoreditch
Ms Eshituku – Queensbridge û De Beauvoir
Enrique Freire – North East Neighbourhood
Kelly O'Neill – Queensbridge û De Beauvoir
Carrie – Shoreditch
Florence Ogunji-Amusan – Homerton

Noel û Sersala we Pîroz Be

Em hêvî dikin ku hun û malbatên we Noel û Sersaleke şa derbas bikin û em dipên ku di 2008an de pev re bixebitin.

Susmita Noonan, Serok Birêvebir (Demî)

Rupert Tyson,
Serokê Desteya Birêvebir

Ronayî li Mare Street pêk hatiye, sezona pantomîn hatiye Empire û hewa pir sar bûye. Dîsa ew dema salê ye, Noel hatiye, û dûre dîsa bi wê lezê, dawîya salê tê.

Ev du sal in ku em nişstecîh û karmendan dibînin û li ser xizmetên mişterî bi wan re dipeyivin, û ji wan dipirsin ku ji bo mikemelkirina xizmetên ji bo nişstecîhan em dikanin çi bikin.

Tiştê ku li ser van civînan bala me kişandiye, hewes û coşa parvekirî ye ku Hackney bike cîhekî çêtir. Û bawerîyek heye ku her çiqas rewş çêtir be jî, hîn jî divê gelek kar bê kirin.
Em fahm dikin ku di 2007an de ketin û rabûn hebûn. Dema ku Hackney Homes rêjeya teftîşa du-stêrk bi dest nexist, ku ji bo bikaranîna fona hikûmetê ya ji bo bernameya Malên Minasib pêwîst e, nişteciîh û karmend hêvî şikestî bûn.

Lê belê di seranserê salê de rabûn jî hebûn. Me xizmeta tamîrên xwe fireh kirine ku bêtir tiştan bidin nişteciîhan; me pêkhatina tevlêbûna nişteciîh hêsan kiriye û bi nişteciîhan re xebatê dikin ku biciîh bikin ku ew di navenda biryardanê de cîh bigirin; û bernameya Malên Minasib çêtirkirina malan li seranserê navçeyê domandiye.

Ji ber ku êdî Sala Nuh nêzîk bûye, em li 2008an dinêrin û bawer dikin ku em dikanin pev re malên li Hackney çêtir bikin. Dûre di 2008an de em ê ji Komîsyona Kontrola Hesaban bixwazin ku şûnve werin û armanca me hîn jî ew e ku em fonan bisitînin ku bernameya Malên Minasib temam bikin.

Em gişt mal û civakên çêtir dixwazin. Ev vîzyona me ya ji bo pêşedemê ye û em bi xurtiî dixebitin ku wê biciîh bikin. Em her tim rast nakin û pêwîstîya me pê heye ku heta ku ya rast bê kirin, hun ji me re bibêjin û bi me re xebatê bikin. Pev re, divê em raber bikin ku navçeya Hackney di rêya rast re dihere û ku pêwîstî û mafê nişteciîhên Hackney Homes bi çêtirkirinên malê heye ku ji nuha de cudatîyek pêk anîne.

Em hêvî dikin ku hun û malbatên we Noel û Sersaleke ewle û şa derbas bikin û em dipên ku di 2008an de pev re xebatê bikin.

Peymana Hevparîyê ya Bakurê Rojava Hat Îmzekirin

Panela Taxê ya Stoke Newington bi ofîsa taxê ya Bakurê Rojava re peymaneke hevparîyê îmze kiriye (Ji alîyê Pathmeads ve tê birêvebirin).

Peyman di derengê Cotmehê di Roja Kêfê ya Hawksley Court de hat îmzekirin û raber dike ku Panel û tîma taxê dê çawa pev re bixebitin.
David Larkinê Serokê Panelê got ku peymana herêmî platformek e ji bo avakirina têkilîyeke çêtir.

“Ew di hîmê xwe de dibêje ku em ê çawa pev re bixebitin - asta xizmeta ku em hêvî dikin û ku em çawa dikanin li hemberî hev erênî û durist bin, da ku li Bakurê Rojava birêvebirîya sîteyê çêtir bikin.”

Hun dixwazin tev li koma min a lêkolînê bibin?

Merheba, navê min Jennifer Jones e û ez li Hackney Homes Karmenda Tevlêbûna Nişteçîh im.

Ez di nav tîmeke pênc karmendên tevlêbûna nişteçîh de dixebitim û karê me ew e ku em nişteçîhan teşwîk û bi hewes bikin ku tev li biryarên sereke yên li ser mal û hawirdora xwe bibin. Em pştevanîya karê bi Komelên Kirêdar Û Nişteçîh (KKN) re dikin, projeyên civakî pêşde dixin, alîkarîya serîlêdanên fonan û gelek tiştên din dikin. Ez nuha li 100 dilxwazan digerim ku tev li kluba min a lêkolînê bibin.

Ji sê mehan carekê, ez ê têkilî bi we re çêbikim û ji we bixwazim ku hun tev li lêkolînekê bibin. Her carê ew ê li ser tiştekî cuda be. Ya yekemîn ew e ku em li ser bernameya me ya lênêrîna plankirî ku tiştên wek ronîkirina sîteyê, boyaxkirin, asansor û lênêrîna herêmên hevpar ên sîteya we dihundirîne, nêrînên we bisitînin. Bi giştî hun biryarê didin ku çawa tev li lêkolînê bibin. Ez dikanim kopîyeke çapkirî ji we re bi postê bişînim, ji we re emailekê bişînim, hun dikanin wê li websîteya me tije bikin, an jî ez dikanim telefonî we bikim û pirsan ji we bikim.
Piştî ku ez ji her kesî şûnve agahîyê bistînim, ez ê dîtîyên lêkolînê û ku em ê nêrînên we çawa têxin nav hesêb bi nameyekê ji we re îzeh bikim.
Û her ji sê mehan carekê ez ê bi korfelaqî komeke serketîyan hilbijêrim ku wek sipasdarîya ji bo tevlêbûnê dê fîşeke £50an bisitînin.
Lêkolîn ê her ji sê mehan carekê li dor 15-20 deqîqên we bistînin. Hun ne mecbûr in ku her carê tev lê bibin, lê belê bê guman ew ê tiştekî hêja be ku hun tev lê bibin.
Heke eleqa we bo tevlêbûnê hebe, ji kerema xwe telefonî min bikin: 020 8356 2117
an jî email bişînin:
jennifer.jones@hackneyhomes.org.uk

Rakirina standardên xizmeta me… hun dikanin alîkarîyê bikin

Standardên me yên Xizmetê çarçoveya awayê ku em xizmetên xwe li gora dem û standardên binavkirî pêşkêş dikin dide. Wek mînak, bersîvkirina pêwîstîyên kirêdar û xwedî-lease'an, kirina tamîrên acil di nav 24 seetan de û baş bikaranîna pere.

Reşnivîsa standardên xizmeta me wan qadên xizmeta Hackney Homes dinixumîne ku xizmetên mişterî, xizmetên

kirêdar, hawirdora sîteyê, dayina kirê, tamîr û lênêrîn, tevlêbûna nişteciîh û xwedîtîya xanî di nav de ne.
Hun dikanin biçin www.hackneyhomes.org.uk ku hûrgilîyên reşnivîsa standardan bibînin û şîroveyên xwe berî dawîya çileyê pêşîn ji Sharene.Labonte@HackneyHomes.org.uk re bişînin an jî telefon bikin bo 020 8356 8891.

Li ser xwe bêtir agahî bidin me

Em naxwazin pozê xwe zêde têxin nav karê we, lê belê em dixwazin ku li ser we bêtir agahîya me hebe. Em dixwazin temenê we, heke hebin seqetîyên we an pirsgirêkên tendurustî, zimanê ku hun dizanin, û heke hun ji me re bibêjin, ol (dîn) û meyla we ya cinsî jî bizanibin.
Ev agahî hemû ji alîyê Hackney Homes ve li gora Qanûna Parastina Datayê nehênî (sirrî) tê hilanîn, lê belê sedema ku em vê agahîyê dixwazin ew e ku em xizmetên xwe li gora pêwîstîyên we pêşde bixin.

Wek mînak, heke em bizanibin ku nişteciîhên me bi çi zimanan dizanin, em dikanin bêtir wergeran pêşkêş bikin. Heke em bizanibin ku gelek ciwan li sîteyekê rûdinin, em dikanin lê binêrin ku bêtir çalakîyên ciwanan pêşkêş bikin. Her weha, heke pir nişteciîhên kal û pîr hebin, em dikanin hewl bidin ku xizmetên ku pêwîstîyên wan bersîv dikin, pêşkêş bikin.

Bi vê nûçenameyê re, hun ê lêkolîneke bi navê ‘Xwe gîhandina xizmetê’ bibînin. tijekirina wê dê tenê 5 deqîqan bajo û hun dikanin wê yekser bi posta bêpere (pûl ne pêwîst e) ji me re bişînin. Her hefte, em xelateke £50 didin nişteciîhekî ku form tije kiriye.

Civînên bê yên TRA

Heke hun tucarî neçûbin civîneke Komeleke Kirêdar û Nişteciîhan (KKN), nuha demek baş e ku hun biceribînin.
Ji bo rojên Çileyê Paşîna 2007an li jêr binêrin:

Regents Estate 7
Rowley Gardens 7
Fawcett Estate 8
Frampton Park Estate 8
Sherry's Wharf 8
Trelawney Estate 8
Kingsland Estate 9
Lincoln Court 9
Wrens Park Estate 9
Banister House 10
Fairbank Estate 10
Woodberry Down North 14
Alden û Broadway Estate 16
Boscobel 16
Gordon Lodge û QE Close 16
Haberdasher Estate 16
Jack Watts Estate 16
Landfield Estate 16
Manor Estate 16
Webb Estate 16
Yorkshire Grove 16
Avenue House û Tower Gardens 17
Colville Estate 17
De Beauvoir Estate 17
Mountford Estate 17
Beecholme & Casimir 23
Defoe North û South 21
East Reservoir 21
Shrubland Estate 21
Somerford & Shacklewell Estates 21

Powell û Hunsdon 22
Nisbet House 22
St Marys Estate 22
Jack Dunning Estate 23
Shepherdess Market 23
Warburton û Darcy Estates 28
Burma Court û Arakan Estate 29
Fields Estate 29
Joseph Court 29
Lea View & Keir Hardie 29
Lordship North Estate 29
Smalley Road 29
Woodberry Down Newton Close 30
Acton Estate 31
Roj dikanin biguherin. Ji bo dem û cîhan ji kerema xwe telefon bikin bo tîma Tevlêbûna Nişteçîh: 020 8356 7845.

Bibin Înspektorekî Nişteçîh

Em dixwazin ku xizmetên xwe çêtir bikin û pêwîstîya me bi alîkarîya we heye. Teftîşên nişteçîhan jî ji bo awayekî tevlêbûna pêşçavkirina pêşkêşkirina xizmetê ye. Em li nişteçîhan digerin ku bibin înspector (mifetîş); ew ê qadeke xizmetê hilbijêrin û wê xizmetê teftîş bikin û bibînin ku çi baş dixebite û çi dikane çêtir bê kirin.

Armanca rola we dê teftîşkirin û komkirina şûnve agahî dayina nişteçîhan a li ser xizmetên ku Hackney Homes pêşkêş dikin be; hun ê her wisa şûnve agahîyê bidin karmendan ku divê çi bê çêtirkirin û sehkirina van çêtirkirinan bikin.

Armancên tîma înspektorên nişteçîh ev in:
• Nirxandina hinek xizmetên ku ji alîyê Hackney Homes ve tên pêşkêşkirin;

• Pêşniyar bike ku xizmet çawa dikanin bên çêtirkirin;
• Li gel karmendan bibe alîkar ku têkilîyeke erênî di navbera Hackney Homes û nişstecîhan de pêk were.

Tiştên ku hun dikanin bikin:
• Meşên li sîteyan
• Teftîşa malên vala ku divê ji nuh de bên kirêdayin
• Teftîşa raporkirinê û kirina tamîran
• Rûbirû an jî bi telefonê ji nişstecîhên din agahî sitendin
• Alîkarîya karmendên ku xizmetan birêve dibin bikin ku fahm bikin ku ji bo jêxweşbûna kirêdaran çi dikane bê kirin.

Kî dikane tev lê bibe:
• Kirêdar û xwedî-lease'ên Hackney Homes
• Mişterîyên ku dixwazin alîkarîya Hackney Homes bikin ku xizmetên xwe çêtir bike û bi mikemelî pêşkêşî kirêdaran bike
• Mirov, ji hemû temen û çandan. Em dilsozê cîhêrengîya navçeya me ne û dixwazin yelpazeyeke mirovan tev li Hackney Homes bibin.

Heke hun difikirin ku bala we dikişîne ….
Pêvajoyeke karmend sitendinê ya tevlêbûna vê projeyê heye – anku divê hun bi tijekirina formeke kurt a serîlêdanê serî lê bidin û divê em binirxînin ku hun li gora wê rolê ne an na. Bila ev tişt we sar neke. Pêwîstîya we bi kûalîfîkasyonan tuneye û ne pêwîst e ku hun tu testan derbas bikin.

Çiqas dem pêwîst e?
Bi pêşdîtina me, teftîş ê salê du caran bibin û her teftîşek ê bi qasî heta du rojan dema we bisitîne. Her wiha dê pêwîst be ku berî ku hun teftîşan bikin, hun tev li perwerdeyeke heta bi du rojan bibin; lê belê perwerde yê ji beşên piçûk pêk bê.

Ev çawa dikane bikêrî we were...
Hun ê sertîfîkayekê bisitînin ku perwerdeya ku hun tev lê bûne belê bike; perwerde bi xwe dê xwe-bawerîya we zêde bike û profîla we ya kar xurt bike.

Em ê her weha mesrefê çûn û hatina we û heke hebe mesrefên zaroknêrên qeydkirî jî bidin û dibe ku xelateke mutewazî jî bi awayekî bidin we.

Heke hun dixwazin gaveke wêdetir bavêjin...
Hun dikanin ji yên jêrîn yekê bikin:
• **AN** ji websîteya Hackney Homes formeke serîlêdanê daxin, tije bikin û bidin postê bo: Sharene Labonte at 136 – 142Lower Clapton Road, London E5 0QD **AN**
• Telefon bikin bo Sharene, 020 8356 8891 û agahîya xwe bidin me **AN JÎ**
• Emailekê bişîne bo Sharene: harene.labonte@hackneyhomes.org.uk û em ê bi we re têkilî çêbikin.

Serîlêdan divê berî 11.01.2008an bên kirin.

Bernameya Malên Minasib didome

Benameya Malên Minasib li çaralî navçeyê pace, serbanî û nuhkirinên din pêk anîne.
Bernameyê ji nuha de guhertineke girîng li navçeyê pêk anîye; ji bo nişteçîhan xanîyan çêtir dike û malan bêtir dilkêş dike.
Wek dibe ku haya we jê hebe, Hackney Homes rêjeya du stêrk bidest nexist, ku ji bo bikaranîna fona Hikûmetê ji bo dawîya mayî ya bernameya Malên Minasib jê re pêwîst bû.
Teva vê derengmayinê jî, bernameya Malên Minasib ê di 2008/09an de bi lezeke kêmtir bidome.
Her çiqas Şaredarîyê ji bo sala bê ya fînansê budçeya xwe çênekiribe jî, ji ber tunebûna fona hikûmetê,

piştevanîya domkirî ya diravîn ji bo bernameya Malên Minasib ê pêşanîyeke Şaredarîyê be.
Me bernameya 2008/09an li gora fonên ku em ê muhtemelen bikanibin bikar bînin pêşçav kiriye û ji her kesê di nav bernameyê de re nivîsandiye. Karê gelek sîte û nîştecîhan dê wek ku hatiye plankirin bidome.

Em konsantre dibin ku berê karên ku hene biqedînin. Pêxistina pace û serbanîyên nuh di nav vê de ye. Lê belê, dê hinek karên derve û karên hundir ên metbex û serşokan bi derengî bikevin.
Her çiqas kar dikane heta bi 12 mehan bi derengî bikeve jî, em ê dîsa jî xwe ji bo destpêkirina kar amade bikin û ji ber vê sedemê, em ê bi we re di mehên bê de lêkolîn û civînên şêwirdarîyê li dar bixin. Bi kirina vê, çer ku fonên zêdekirî yên hikûmetê peyde bibin, em ê bikanibin tavilê dest bi kar bikin. Armanca me hîn jî ew e ku em fona zêdekirî ya hikûmetê bidest bixin û em di 2008an de teftîşeke din a Komîsyona Kontrola Hesaban dixwazin, da ku fonê bidin serbesthiştin.

Heke pirsên we hebin, ji kerema xwe li gel xeta lêpirsînê ya Malên Minasib têkilî çêbikin an jî email bişînin bo:
dhenquiries@hackneyhomes.org.uk

Hun her wisa dikanin ji bo bêtir agahîyê biçin websîteyê jî: www.hackneyhomes.org.uk.

Bi Endamê Desteya Birêvebir ê Hackney Homes Jonathan McShane re 60 sanîye

Nûçenameya Hackney Homes vî çendî xwe gîhand Jonathan McShane ku li ser rola wî ya di Desteya Birêvebir û eleqa wî ya alîkarîya Hackney Homes bo pêşkêşkirina xizmetên mikemel ên xanî gotûbêj bike.

Bi xêr hatin bo Hackney Homes, Jonathan. Hun dikanin ji me re çenekî li ser xwe agahîyê bidin?
Ez eslen ji Glasgow im û berîya bêtirî 10 salan min bar kir bo Hackney. Ez bûm endamê encumena şaredarîyê, ji ber ku min dixwest derfet hebe ku ez di herêma xwe de guhertinekê çêbikim. Piştgeha min a kar komunîkasyon e û ez nuha ji bo şêwirdarîyekê dixebitim û şêwirdarîya mişterîyên sektora gelêrî dikim. Ez her weha Governorekî Xwendegeha Randall Cremer im, li Hackney. Li şaredarîyê ez her weha serokatîya Tendurustîyê li Komîsyona Çavdêrîyê ya Hackney dikim.

Li Hackney rûniştin, di çend salên çûyî de we çi guhertin dîtin?
Hackney gelekî guherîye – bi alîyê başîyê ve. Civaka me gelekî bêtir cîhêreng e û ji alîyê herêmî ve û li seranserî navçeyê hinek guhertinên bi heyecan pêk tên. Hinek mînak ji bo we – sûc kêm dibe, xwendegeh çêtir dibin, mal tên çêtirkirin – pêwîstî tune ye ku bidomînim.
Lê belê hîn jî divê gelek tişt bên kirin.

Teftîşa 2008an dipên, hun çi dijwarîyan dibînin li pêş?
Dijwarîyeke sereke tevlêkirina yelpazeyeke fireh û cîhêreng a nişstecîhan bo xizmetên ku Hackney Homes pêşkêş dikin e. Em gişt dizanin ku heke pirsgirêkek tunebe, îhtîmala ku mirov biçin ba xwedîyê xanîyê xwe kêm e, lê belê divê em wê mentalîteyê biguherînin, da ku ji ber ku nişstecîh bawer dikin ku em ê li wan guhdarî bikin û nêrînên wan ên ji bo pêkanîna çêtirkirinan li pêş çav bigirin, werin ba Hackney Homes.

Hun di dema xwe ya vala de çi dikin?
Ez hîna nuh li zanîngehê vegerîyame ku di Sîyaseta Gelêrî de Master bikim, ku gelek dem disitîne. Ez her weha hewl didim ku bibezim ku bijûn bimînim, ez salê di maratonekê de direvim ku ji bo Kluba Keştîyan a

Laburnum peran kom bikim. Û erê, ez ê di Nîsana 2008an de di Maratona Londonê de bibezim û dê bipêm ku her kes sponsorîyê bike.

Çêtirkirina xizmeta me ya tamîran … ji me re alîkarîya we divê

Îsal di Hezîranê de, Hackney Homes dest bi Kartên Xizmeta Mişterî kir – wek awayekî din ku em çavdêrîya performansê bikin û her wisa bibînin ku tamîrên ku li mala we hatine kirin çiqasî bi dilê we ne.

Kart bi her karê tamîrê yê ku Navenda Têkilîyê ya Tamîran saz dike tê pêvekirin, da ku piştî ku karker karê tamîran diqedînin, bikanibin kartan bidin nişstecîhan.

Jim Shepherdê Birêvebirê Kalîte û Sîstemê yê Hackney Homes got ku ji dema ku kart hatine destpêkirin û vir de, şûnve agahî dayina nişstecîhan, di astên bilind de jêxweşbûna mişterî dîyar kiriye.

“Di çar mehên çûyî de, bêtirî 800 kart bi şûn ve hatine şandin ku raber dikin ku tamîrên ku hatine kirin bi dilê mişterîyan in. “Bi giştî, şûnve agahî dayina nişstecîh raber dike ku jêxweşbûna mişterîyan ji tamîran li dora %90 e, ev yek û lêkolînên bi telefonê yên piştî kirina karekî tamîrê, ji alîyê Navenda Têkilîyê ve hevgirtî ne,” Jim digot.
Hinek mînakên şîroveyên ku me ji nişstecîhan sitendine li jêr rêzkirî ne:

“Cîhê kêfxweşîyê bû ku xeratekî wek Leroy (South Base) li mala min dixebitî. Ew kibar, bi kêf û piştî ku karê xwe qedand pir paqij bû”

“Karê karmendan bi dilê min bû”

“Xizmet mikemel bû. Sipas”

“Li ser ku ez dikanim çi têxim jêrê destşoka metbexê û çi neximê, temîyên baş li min kirin”

“Xizmet pir bi dilê min bû”

Kartên xizmetê yên bihayê postê dayî jî qadên çêtirkirinê dîyar dikin, lewra HEMÛ şûnve agahî dayin bi nirx e. Cara bê ku karmendekî tamîrê were mala we, ji bîr nekin, karteke xizmeta mişterî bixwazin.

Bakurê Rojava (Stoke Newington) seetên xizmetê zêde dike

Tîma kirê nuha bi telefonê di 9.00 – 18.00an de peyde dibe.
Hun dikanin ji bo têkilîya bi tîmê re telefon bikin bo 0208 356 6048/3547 û planeke kirêdayinê saz bikin an bi telefonê bi karta kredîyê yan debîtê pere bidin. Ji kerema xwe not bikin ku civînên bi tîma kirê re divê dîsa jî di 9.00 – 17.00an de bin.

Tîma kirê ya li Ofîsa Taxê ya Bakurê Rojava (Stoke Newington) seetên xwe yên xebata telefonê dirêj kirine, da ku bêtir dema nişstecîhan hebe ku telefon bikin û lêpirsînên kirê gotûbêj bikin. Tîm dilsoz e ku ji bo kêmkirina deynê kirê û çêtirkirina xizmetan alîkarîyê bike.

Tirkî zimanê we yê yekemîn e? Pêwîstîya we bi şêwirdarîya xênî heye?

Projeyeke şêwirdarîya xanî vê dawîyê bi karmendên Hackney Homes û Balik Arts re li Ofîsa Taxê ya Bakurê Rojava hatiye saz kirin.
Kirêdar û xwedî-lease'ên Tirkîaxêv ku li xanîyên li Taxa Bakurê Rojava rûdinin dê bikanibin agahî, şêwirdarî û rêberîya li ser mijarên wek deynên kirê, alîkarîyên sosyalê, mijûlbûna bi şêlên antîsosyal an mal barkirinê ji Yeşim Güzelpınar-Karakuşa Şêwirdareke Tirkîaxêv bisitînin.

Şêwirdarî roja Duşemê li Avahîya Şaredarîya Stoke Newington peyde dibe, Stoke Newington High Street, N16 0JR. Ji bo randevûyeke roja Duşemê telefon bikin bo 020 8356 6105. Şêwirdarî her wisa rojên Pêncşemê jî peyde dibe li Balik Arts, Tohum Cultural Centre, 3 Tyssen Road, N16 7NA.
Ji bo sazkirina randevûyeke roja Pêncşemê telefon bikin bo 020 7254 7897.

Ji bo alîkarîya Civaka Bangladeşî ya Hackney xebata hevkarîyê

Hackney Homes bi fîrmaya herêmî ya perwerdeya pîşeyî UXL û Komela Xanîyan a Bangla a Londonê re hevkarîyê dike ku kursên Îngîlîzî yên ji bo axaftvanên zimanên din (ESOL) ji bo civaka Bangladeşî li Londonê saz bikin.

Jackie Loftusa Karmenda Projeyê ya Hackney Homes got ku kursên ku derengê Mijdarê dest pê kir bi alîkarîya Komela Kirêdar û Nîştecîhan (KKN) a herêmê pêk hatine û ji nuha de di nav civaka herêmê de populer bûne.

"Taxa Bakurê Rojava ya Hackney teva Bangla Housing wek herêmeke bi hejmareke zêde ya nîştecîhên Bangladeşî hat binavkirin. Em bi KKN'a Landfield Estate

re xebatê dikin ku bikaranîna hola komelê ji bo kursan misoger bikin," Jackie digot.

Kursên perwerdeya Îngîlîzî ku ji alîyê Sazîya Avakarîya Londonê ve tê fonkirin bi taybetî ji bo civaka Bangladeşî (ji 16 salî mezintir) hatine sazkirin, da ku ji wan re bibe rêyeke bidestxistina zîrektîyên ziman û perwerdeya kar ku bikanibin ji bo kar amade bibin. Endama Encumanê û Desteya Birêvebir a Hackney Homes, Linda Kelly ewên din teşwîk dike ku tev li perwerdeya kar a bêpere bibin. "Kursên ESOL ji bo hin endamên civaka Bangladeşî pêpelikan pêşkêş dikin ku kar peyde bikin. Ev proje ji bo wê yekê ye ku alavên rast û perwerdeya kar bide civakê ku gavan pêşde bavêjin," Endama Encumanê Kelly digot. Kursên perwerdeya kar Duşem û Sêşemê li Landfield Estate Community Hall tên birêvebirin. Kreşeke bêpere heye û çûnûhatin tê sazkirin. Ji bo bêtir agahîyê têkili çêbikin li gel Loftus li 020 8356 7863.

Zêdebûna kirê ji 7 Nîsan 2008an û pey ve

Hun ê di demek kin de nameyekê ji Serok Birêvebira Hackney Homes, Susmita Noonan bisitînin ku li ser zêdebûnên kirê ji 7 Nîsan 2008an û pey ve agahîyê bide we.
Dayina we ya kirê ji kirêya bingehîn a mala we û bihayekî xizmetê yê cîhê ji bo xizmetên sîteyê yên ji bo piranîya kirêdaran pêşkêşkirî pêk tê. Paqijî, lênêrîna zemînan, ronîkirina cîhên hevpar û yelpazeyeke fireh a xizmetên ji bo ewle kirin û lênêrîna sîteya we di nav vê de ne.

Ev awayê hesibandina asta kirêya xanîyê we ji bo wê yekê hat pêşniyar kirin ku Hikûmet dixwaze ji bo milkên şaredarî û komelên xanîyan yên wek hev li heman herêmê heman astên kirê hebin. Wek encam, li gora qaydeyên Hikûmetê, kirêya bingehîn a kirêdarên Şaredarîyê yên li

Hackney divê heta bi 2011an her sal zêde bibe ku bigihêje vê asta wek hev. Hikûmet nahêle ku di salekê de zêdebûnên giran çêbibin. Lê belê, şaredarî û Hackney Homes mecbûr in ku di hesibandina kirêya we de li gora qaydên Hikûmetê tev bigerin.

Em ji bo ku divê kirê bi çiqasî zêde bibe nêrînên we dipirsin. Ji kerema xwe ji bîr nekin û berî dawîya meha yekê nêrîna xwe bibêjin.
Heke pirsên we hebin, ji kerema xwe li gel ofîsa taxê ya herêma xwe têkilî çêbikin; ew ê bikanibin pirsên we bersîv bikin û bêtir agahî bidin we. Hun her weha dikanin ji bo bêtir agahîya nûjen biçin websîteya Hackney Homes.

Nûçenameya Xwedî-lease û Xwedî-milkan

Konferansa Xwedî-lease û Xwedî-milkan
Tarîx: Şemî 26.01.2008

Em ê yekemîn **Konferansa xwe ya Xwedî-lease û Xwedî-milkan** şemîya 26.01.2008an li dar bixin. Çalakî yê li vir were lidarxistin: the Ocean, 270 Mare Street, E8 (li hemberî Hackney Town Hall) 10.00 – 16.00.

Konferans ê li ser yelpazeyek mijarên bi xwedî-lease û xwedî-milkan eleqedar li cîhekî, agahîyê pêşkêş bike. Dê ji alîyê axaftvanên sereke pêşkêşî hebin, her weha desgeh û komên gotûbêjê.
Me konferans bi Foruma ji seranserî navçeyê û Komela Xwedî-lease'an a Bakurê Rojhilat (NELA) re saz kiriye. Ew xwedî-lease û xwedî-milkên ku tevlêbûna xwe daye qeydkirin ê di demeke kurt de nameyekê bisitînin ku cîhê wan ê çalakîyê belê bike. Cîh bi sînor e, lewra em tenê dikanin heta bi 250 kesan bicîh bikin.

Lêkolîna Jêxweşbûnê ya Xwedî-lease
Encamên Lêkolîna Xwedî-lease'an ku îsal hat sazkirin, bidest ketine û xwedî –lease'an hinek qadên xizmetê yên Hackney Homes destnîşan kirine ku divê bên çêtirkirin. Qadên wek heqê pere dayin û şêwirdarîyê ji alîyê xwedî-lease'an ve wisa tên dîtin ku divê bên çêtirkirin.
Wek bersîvkirina vê şûnve agahîdayinê, tîma Xwedî-lease û Mafê Kirînê komên fokusê saz kirine ku nîştecîh li ser qadên taybetî yên xizmetê û ku difikirin ku divê çawa bên çêtirkirin, nêrînên xwe bînin zimên.

Komên fokusê nuha dest pê kirine û ji alîyê Sazkerekî Serbixwe yê ji Tora Kalîta Xanî ve tê birêvebirin, da ku nehênîhiştina nêrînan misoger bike.

Encamên şûnve agahî dayinê ku ji van komên fokusê bên sitendin dê di destpêka 2008an de bên weşandin.

Nûçenameya Xwedî-lease û Xwedî-milkan a Çileyê Pêşîn
Di Nûçenameya Xwedî-lease û Xwedî-milkan a Çileyê Pêşîn de bêtir agahî heye. Hun ê nivîsên li ser xizmetên ku em pêşkêş dikin û çêtirkirinên ku me pêk anîne bibînin. Hun dikanin hemû karên erênî bibînin, ku ji alîyê Tîma Ewlehîya Sîteyê ve bi hevkarîya Polîs tê kirin, da ku serî bi şêlên antîsosyal derxînin, ku em çawa xizmetên xwe pêşçav dikin ku bêtir heqê pere bidin. Heke şîrove an pêşniyarên we hebin, ji kerema xwe wan bişînin bo LHFHnews@hackneyhomes.org.uk an jî LHFH Newsletter, Freepost, RLRL-HJUX-RKTS,
298 Mare Street, London, E8 1HE

Performans bi kurtî
Rêjeya telefonên di 5 lêdanan de bersîvkirî 96.17% 96.25%
Dîtina kesên ku hatine resepsîyonê di 5 deqîqan de 78.42% 71.03%

Dîtina kesên ku hatine ofîsê ji bo hevpeyvînekê di 15 deqîqan de 86.72% 84.18%
Bersîvên name, faks û emailên gilîyan di 15 rojên xebatê de 89.57% 93.75%
Bersîva gilîyan di 15 rojên xebatê de 95.73% 95.93%
Dema averaj ji bo rakirina nivîsên dîwaran(grafîtî) ên sûcên êrîşkarî û nefretê (averaj 3 seet) 56 deqîqe 45 deqîqe
Rêjeya tamîrên normal ên di 20 rojên xebatê de qedandî 94.72% 98.06%
Rêjeya tamîrên rewşa acil ên di 24 seetan de qedandî 92.97% 93.85%
Rêjeya karên yekser kirinê ên di 2 seetan de qedandî 97.78% 97.74%

Dick Whittington û pisîka wî hatin Hackney Empire

Li gel her tiştê ku meriv ji pantomîmekî kevneşopî bipê û performansa kevneşopî jî di nav de bêtirî wê, set û kostumên hêja, dîmenên bi efsûn, muzîk û dansa bi heyecan, komedîya zêde bi ken û keyfa mezin.

Dick Whittington ê ji alîyê Hannah Jane Fox ve bê lîstin, Tameka Empson wek Fairy Bowbells vedigere û Kat B wek Idle Jack.

Empire ji bo veqetandinên koman bilêtên erzankirî pêşkêş dike. Çima li gel hevalan û malbatê êvareke xweş pê derbas nakin? Bilêt tenê ji £9.50an dest pê dikin

Têkilî bi me re

Gelek awa hene ku hun bikanibin bi me re têkilî çêbikin …

Telefon an çûyina Ofîsên me yên Taxê:

Bakurê Rojhilat (Stamford Hill)

Clock House, 149 Stamford Hill,
London N16 5LG
Telefon: 020 8356 6500
Nightingale Estate Office,
20 Olympus Square, London E5 8PL
Telefon: 020 8356 1914

Bakurê Rojava (Stoke Newington)

Stoke Newington Municipal Offices,
Stoke Newington Church Street,
London N16 0JR
Telefon: 020 8356 6100

Homerton

92 Well Street, London E9 7JA
Telefon: 020 8356 7800

De Beauvoir & Queensbridge

31 De Beauvoir Road,
London N1 5SJ
Telefon: 020 8356 6600

Shoreditch

1 Cropley Street, London N1 7PT
Telefon: 020 8356 6705
2 Whiston Road, London E2 8BW
Telefon: 020 8356 1731

Lêpirsînên xwedî-lease û xwedî-milkan

298 Mare Street, London
E8 1HE
Telefon: 020 8356 2100
Email: Leaseholders@ Hackneyhomes.org.uk an jî service.charges@ hackneyhomes.org.uk or major.works@ hackneyhomes.org.uk

Raporkirina tamîrekê

Telefon: 020 8356 3691
Email: RepairsRCC@hackneyhomes.org.uk
Înternet: www.hackneyhomes. org.uk/h-housecall.htm

Gilî yan pesnekê bidin me

Telefon: 020 8356 5022
Faks: 020 8356 5091
Email: housing.complaints@hackneyhomes.org.uk
Înternet: www.hackneyhomes.org.uk/hc-complaints.htm

Tundûtûjîya nav malê an sûcê nefretê

Telefon: 020 8356 4459 or
Telefona bêpere: 0800 056 0905

Hejmarên telefonê yên din ên kêrhatî

Raporkirina dengzarîyê: 020 8356 4455
Avêtîyên gir/paqijîya cadê: 020 8356 6688
Vezîvirandin: 020 8356 6688
Alîkarîya kirêya xanî û baca şaredarîyê: 020 8356 3807
Lêpirsînên baca şaredarîyê: 020 8356 3154
Tîma Tevgerînê ya Xanî: 020 8356 5760
Ronîkirina Cadeyan: 020 8356 2897
Destûrên parkê li cadeyan: 020 8356 8877
(ji bo destûrên parkê li sîteyan bi ofîsa taxa xwe re têkilî çêbikin)
Xizmeta Navberkarîyê ya Hackney: 020 8356 4794
Projeya Serdegirtinê: telefona bêpere 0800 073 1779

www.hackneyhomes.org.uk
Hackney Homes Limited. Li Îngilîstanê qeydkirî hejmar: 5663757
Ofîsa Qeydkirî: Christopher Addison House, 72 Wilton Way, London E8 1BJ
Hackney Homes Limited şirîkeyek e ku ji alîyê Navçeya Hackney a Londonê ve tê kontrol kirin
Design & Communications afirandiye • Şaredarîya Hackney • Çileyê Pêşîn 2007 • PJ33205 • li kaxeta %100 vezîvirandî hatiye çapkirin